**Em bi serhildana xwe berxwedanê, bi berxwedanê jî jiyanaeke azad û wekhev dihonin**

Jinên karker ên tekstîlê, li Newyorkê di sala 1857an de ji bo jiyana wekhev û azad , ber xwe dan. Dewlet û sermaye xwestin kû bi qirkirinê vî berxwedanê tune bikin. Lê belê serhildana ku ji wê kargeha tekstîlê bilind bû, bi sedan sale bûye nîşana têkoşîna jinên enternasyonal ên ji bo wekhevî û azadiyê têdikoşin .û îro jî ev têkoşîn hê berdewam dike.

Bi nêzbûna 8ê Adarê, em hemû jinên kû ; ji bo jiyana azad û wekhev têkoşiyane, ji bo vê berdêl dane, hatine qetilkirin û wendakirin, bi rêzdarî bi bîr tînin. Têkoşîna me jinan, têkoşîna Clara, Rosa, Sakîne, Louise, Gonca Kuriş, Nagihan, Arîn Mîrxan, Silham Hasan û Mahsa Aminiyê ye.

hemû jinên ku îro, ji ber, têkoşîna azadî, wekhevî û sosyalîzmê di girtîgehanda tên girtin, birêzdarî silav dikin. Têkoşîna me jinan, têkoşîna Fîgen Yüksekdağ, Ayşe Gökhan, Leyla Güven, Tanya Kara, Nergis Muhammedî, Pakhshan Azîzîyê û di şexsê wan de têkoşîna bi hezaran jinên di girtîgehan de ye.

îsal di 8'ê Adarê de; Bi mîrateya berxwedana jinên ku li hemberî sîstema mêrserwerî ya bi hezar salan serê xwe netewandine, li hemberî tarîtiya ku me dorpêç kiriye, rêya têkoşîna hev dû ronî dikin.

Em li hemberî şer, îstismar, talan, xizaniyê û siyaseta dijminatiya li ser jinê serî radikin!

Bi gotina "Em hebûn, em hene û em ê hebin", re dîroka, nihaya û pêşeroja jiyana azad û wekhev in! Li vê erdnîgariyê, bi gotina "an jiyan an jî barbariya kapîtalîzmê" em li her derê ne!

Di serî de li Rojhilata Navîn û li çar aliyên cîhanê, êrîşên sîstema kapîtalîst a mêrserwer, netewdewlet û rejîmên hukûmetên çeteyî, kû yên li ser nasname, çand, bawerî, ked û bedena jinê didomînin em qebûl nakin.

Di şerê Îsraîlê yê li ser Filîstînê de, jinên Filîstînî yên ku di hedefa qirkirinê de ne, ne tenê ne. Hemû cihan bigihîje hev jî li hemberî jinên Filîstînî, bi êrîşên xwe yên zayendî, ew ê nikaribin rûyê berxwedanê yê jinan ji holê rakin. Em bi jinên Afganîre ne ku li hemberî zilm û zordestiya herî giran a zayendî ber xwe didin. wexta kû tarîtiya tundî û newekheviyê li her derê kûr dibe, hêza berxwedan û piştevaniya me jî bilindtir û bihêztir dibe.

ew jinên kû li Îranê, li hemberî rejîma molayan bi hêrs dibêjin "em ê jiyanê ji nû ve bistînin", ew jinên kû li kolan û li girtîgehan de ber xwe didin re; em bi felsefeya me ya "Jin, Jiyan, Azadî"û bi telên porê Jîna Emînini em serhildana xwe dihonin. Rejîma molayan a dijminê jinê nikare demê paş ve bibe, li Îranê serdema jin û gelan wê bi serkeve.

Li Sûriyê jinên Elewî, Dûrzî, Suryanî, Xiristiyan, Tirkmen, Kurd û Ereb kû di bin lepên zayendperestî û nijadperestiyê de dixwazin bên qetil kirin; li hemberî hemû çeteyên mêrserwer û rejîmê, em dibin dengê jinên ku ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk têdikoşin .

Em îlhama xwe ji jinên Rojava digirin ku çeteyên DAIŞ'ê ji holê rakirin, li Rojhilata Navîn sîstemên mêrserweriyê serûbin kirin û şoreşa jinê ava kirin. ew şoreşa jinê ye ku nîşanî hemû cihanê da; Şoreşa gelên Rojava de wekhevî, azadî, aştî û jiyaneke din di van axanda pêkan e.

Oğuzlar Mahallesi 1388. Caddesi. 32. Sokak No:37 Balgat Çankaya/Ankara
0312 427 17 80 – iletisim@demparti.org.tr

Banga me HTŞê û hêzên kapîtalîst ên ku ji bo teslîmgirtina şoreşa jinê çarmedor êrîş dikin re ye: em dibêjin  Li her derê em Rojava ne, Rojava em in. ew pergala mêrserwer ya  ku dixwaze jinê bê nefes bihêle re em dibêjin; Rojava dilê me hemû jinan e, cîhana wan e.

Em ê rê nedin fetwayên bêehlak ku bedana jinê weke xenîmet dibîne û lê îşkence dike, keziyên jinan jê dike. Em, ew jinin ku bi honandina berxwedana xwe ji hevdu re bûne sîper. Hişmendiya kû ji keziyên me ditirse, bi girtin û binçavkirinan helbet nikare  piştevaniya me  bi jinên Rojava re rawestîne. Bi hêrsa xwe, bi serhildana xwe û bi piştevaniya jinen re, em hê jî dîwarên desthilatdaran hildiweşînin.

Di vê 8ê Adarê de
Ew labirenta şer a li Rojhilata Navîn de em rêya aştî û demokrasi bi gotina xwe bi tekoşîna xwe bi qewîn kirina aqubeta hevdu re em ê bibînin.

ew neyarên jinan ku; serîde li Rojhilata Navîn û du re li hemû cîhanê  bi şer û talanê rêve dibin, nas dikin û rûyê wan ê kirêj eşkere dikin.
Rûyê rastî yê pergala kapîtalîst a mêrserwer ,  wekî kujera mêr a hezar salî, bi dosyayên Epsteînê careke din derket holê. Em,ew  kesên bi şer xwe têr dikin, kujer, îstîsmarkar û me ji jiyan û axa me didizin, baş nas dikin.

Doza Epsteinê, ne kemasiyeke di nav pergalê de ye, ne jî sûcekî takekesîye. Ew yekbixwe ya vê pergala riziyayî û xerab e. Rastiya pergala mêrserwer, kujer, mafya, çete ye ku tenê di bin erdê de nîne. Ev rastiya kujerî û îstismarkariya pergala mêr-dewlet-sermaye, ya li hemberî jin û zarokan e. Hişmendiya kû Narîn Guran qetil kir li herderê ye.
Tehemula me ji hişmendiya we ya “tiştek nabe bimin”re û polîtîqayên we yên bêcezahiştinê re nemaye.
Em rûyê rastîn ê vê pergalê eşkere dikin û em bangawazî dikin werin di 8ê vê adarê de ji bo ronîkirina tariya li ser jin û zarokan, em hesap ji wan bipirsin.

Em pergala desthilatdariyê ya ku sala 2025an weke sala malbatê îlankiriye û roj bi roj jinan tune dihesibîne, nas nakin. Em dest ji Peymana Stenbolê û deskeftiyên xwe bernadin. Bêyî ku bêjin şev an jî roj, bi hêrsa xwe li tax û sikakan, em bihevrebûn û hevgirtinê dihonin.

Li vî welatê ku jin her roj tên qetilkirin, ji bo jiyana xwe, em jin têkoşîna xwe digihînin hev. Li dijî şer aştiyê, li dijî talankeriyê xwezayê, li dijî hişmendiya tunehesibandinê hebûna xwe, keda xwe, vîna xwe, laşê xwe, em tev bi hev re diparêzin. Em jin li vî welatî bi têkoşîna xwe, aştiya birûmet, jiyana gelan ya azad û wekhev ava dikin.

Em li ser vê axê bi dehan salaye tekoşîna aşitiyê dimeşînin.  Hemu desthilatdaran di şuna rêbaza çareseriya demokratikde  bi hilbijartina inkar u politikayên şer, lime li jiyanên me wekî kur buyina Eş û birîna vegeriya.  Em jin bi hêza piştgırî û tekoşîna hevdu re hewil da kû birine xwe sax bikin.

Banga Aştî û Civaka demokratîk ya Birêz Öcalan ya 27ê Sibatê, rêya çareseriya birînane ku ji ber şerî hatiye derketin.
 banga pêşeroja gelan a hevpar e ku bi hevdu re hatiye honandin. Siyaseta aştiyê û îrada wê ye. Beşdarbûna banga wêrek a ji bo çareseriyê, ji bo me jinan têkoşîna bi hêvî li pêşerojê nêrînê ye ku her diçe em kurtir hîs dikin.

Ji bo avakirina aştiyê, azadiya fîzîkî ya Birêz Öcalan û xwedî derfetê xebatê bûyîn, garantiya çareseriya pirsgirêka kurd ya bi rêya demokrasiyê ye. Di 8ê vê adarê de em ê li dora hêvî û aştiyê kom bibin.

siyaseta qeyûm ya ku pergala me ya hevserokatiyê hedef digire û polîtîqayên şerê taybet ku jiyana jinên ciwan didize Em ê bi têkoşîna xwe ji holê rakin. Ji bo bîranîn û mafê bi hezaran jinên ku wekî Denîz Poyraz, Rojîn Kabaiş, Durdona Xokîmova, Gülistan Doku, Elev Koç hatine qetilkirin û winda kirin, me dev ji hesab pirsîna wan bernedaye, em ê dev jê bernedin. Li her qada ku em lê ne, em ê bi serhildana xwe bibin tirsa vê pergala dijminê jinan.

 Li dijî  ew merserweriya ku bi Politiqayên nefreta sazumanî ve li hemberê mafê  jiyana LGBTİ+ an benda dihonin, rawestandina wî parastina Jîyanê ye. Li dijî qanûnên tûrikî, gotinên binefret û tundiyê, em jiyana xwe bi hebûna xwe nas dikin. Di vê hevgirtinê de yek ji me kêm be, nabe.

Têkoşîna jinên astengdar, têkoşîna li hemberî nîjadperestî, zayendperestî û saxlemperestiyê ye. Em dixwazin serhildan û çoşa 8ê Adarê, bi çoş û serhildana jinên astengdar re bigihînin hev. Ji bo bihîstina dengê hev, em bang dikin, werin em bibin dengê hev.

Li hemberî xîzaniya jinan em hemû bi hev re serî radikin. Li hemberî di her qeyranê de fatorê li keda jinan tê birîn û ji qepa nanê wan  tê dizîn, bi vî yekê bêhna me teng e. Bi serketina ew grevên jinan kû di dorpeça tundiya sermaye û desthilatdaran de ye; ewê bibe derdê vê pergalê.  8ê vê Adarê ew ê hemû der bibin qadên berxwedan û grevên jinan.

Em dizanin çareserî di berxwedana jinan a bi israr de ye.

- Ji bo welatekî berdêla gihîştina nanê ne mirin be, jiyaneke birûmet be,
- Ji bo mafê jiyana me bi nefretê ji me neyê stendin, tevî cudahiyên xwe em bibin garantiya mafê jiyana hevdû,
- Ji bo li hemberî pergala dadgehê ya qetilkirina jinan bê ceza dihêle û kujêran paqij dike, fikra qetilkirina jinan jî weke şerma mirovahiyê bê dîtin be,
- Ji bo welatekî ku cihê patarastina azadiyê ne girtîgeh, bi azadî nêrîna ber bi ezman be,
- Ji bo ware kî jinan ya komareke demokratîk  em 8Ê ADARÊ Lİ QADAN İN.

Di 8ê vê Adarê de,

Oğuzlar Mahallesi 1388. Caddesi. 32. Sokak No:37 Balgat Çankaya/Ankara
0312 427 17 80 – iletisim@demparti.org.tr

BI SERHILDANÊ EM BERXWEDANÊ,
BI BERXWEDANÊ JÎ JIYANA WEKHEV Û AZAD DIHONIN.

**Jın Jıyan Azadî**
**Bıjî Hevgırtına Jınan**

**Meclisa Jinan a DEM Partiyê**
**18 Şubat 2026**

Oğuzlar Mahallesi 1388. Caddesi. 32. Sokak No:37 Balgat Çankaya/Ankara
0312 427 17 80 – iletisim@demparti.org.tr